

Hin pirsgirêkên wergerê di kurmanciyê de

Îbrahîm Seydo

Ez dibêjim wergernasî, beyî ku ez di derheqê wê de bi tiştêkî zanibim.

Molière

0. Destpêk û pirsgirêk

Di mijarên ku zanistiyê pêwîst dikin de, em weha fêr bûne ku peyvên gilover û carinan jî qelew li pey hev rêz bikin û bi vî awayî beyî ku tiştêkî bibêjin behsa hin mijarên giring bikin. Ravekirina têgihîştinan û refleksiyonên li ser karên ku bi huner, ziman û wêjeyê ve tekildar in li cem me rengêkî weha wergirtiye û em bêyî argumentan bi hêsanî dikarin di derheqê başî û nebaşîya karekî de binivîsîn. Hevokên otorîter ku sedemên wan ne zelal in, hikumdayina di derheqê berhemana de ya ecêb, şewazeke gilover ku behsa tu kesî tu karî neke û sîmulasyona zanîne ku hemû helwêstên me yên ramanî xistine bin desthilatdariya xwe êdî bûne taybetmendîya entelîjansiyaya me. Em di vira de dibêjin “sîmulasyon”, lewre em naxwazin peyvên weke “derew” û “xapandin” ji bo van celeb mijaran bi kar binin.

Di civata me de herkes bi hertiştî dizane û di derheqê hertiştî de ferman û fetwayê derdixe. Di civateke weha de ku herkes xwe li hertiştî radikişîne û (me berê jî gotibû) her kesê ku dizane du peyvên bîne ser hev dibe nivîskar û piştî xwe dispêre rêxistin û dezgehên siyasî, zanîneke erzan bûye rengê nîqaşên têgehî, peywendiyên “xal û xwarzêtiyê” (ahbab çawuş) û herweha berjewendiyên şexsî di ser yên estetîk û zanîne û profesyonelîyê re be, ne hêsan e ku mirov behsa karên ciddî bike. Yê ku nizane bê roman çî ye û hê roman nexwendine dikare li ser awayê nivîsandina romanê li orta Diyarbekirê semîneran bide, yê ku nizane ziman çî ye dibe mîrê zimannasan û nîqaşan dike, yê ku nizane bê kurd çî ye dibe siyasetmedar û “rewşenbîr”. (Ji xwe etîketa rewşenbîriyê êdî li dikanên rêxistinên tîn firotin). Ya balkêş jî ew e ku herkes vê rexneyê li hevdu digire, lê kes li xwe nanihere.

Di mijara wergerê de, bi qasî ku di karên ku heta nuha hatiye kirin re diyar dibe, xelk jî sloganan û peyvên qelew pirr hez dikin û ji ber wê jî hewil didin ku bi gellek hevokên manşetan ve behsa giringiya wergerê bikin. Lê belê, giringiya wergerê û fonksiyona wê ya di peywendîya ziman, wêje û çand û neteweyan de êdî ji aliyê herkesî ve tê zanîn û pêdiviya me pê tuneke ku kesek dersê bide me. Yanî, ne bi tenê di wergerê de, di zimên de, di wêjeyê de, di felsefeyê de, di dîrokê de û herweha di siyasetê de, êdî bes e ku xelk rahêjin meqesê û xwe li ser me fêrî berberîyê bikin.

Stratejiya bikaranîna zimanê nivîskî û hewlên bipêşdexistina wêjeya wî zimanî li hemû welatan mîna hevdu bûne ku mîna wê ya herî baş ku li cem me tê naskirin, bandora wêjeya ewropî ya li ser wêjeya rojhilatî ye ku di sedsala 19'an de dest pê kiribû û bûbû sedema ku wêjeya rojhilatî di vegotinê de çêşnên nuh nas bikirana ku îroj jî li ser bingehên pexşanê tîn naskirin. Ev çêşnên weke roman, çîrok, şano, cerribandin, rexne û hwd. bi rêya xwendinên bi zimanên din û bi rêya wergerê ve di zimanên rojhilatî yên mîna turkî, farisî û erebî de jî hatin bikaranîn. Yanî, bi gotîneke kurt û kurmancî, teqlîda ku di bingehê wêje û hunerê de hebû, di bingehê pexşana rojhilatî de jî hebû. Ev bingeh bi wergerê ve hat çalakkirin û xurtkirin.

Heke îroj em hemû bi vî fonksiyona wergerê ve dizanin, hingê divê em dev ji pêşniyarkirina wergerê berdî û bes bibêjin ku “werger ji bo me baş e” an jî « werger pêwîst e ». Lewre, êdî divê em vî milletî û vî xwendevanî nexin şûna bêhişan û bikevin nava qadeke din ku bêtir bi kêrî me û zimanê me ve were. Ji dêleva pêşniyaran, hingê mirov dikare lê binihêre ka bê heta nuha werger li cem me çawa tîn kirin û pirsgirêkên me yên sereke di warê wergerê de çî ne û gelo mirov dikare bi çî awayî bike ku wergera me baştir bibe û fonksiyona xwe ya ku em jê hêvî dikin jî pêk bîne.

Em ê vê pirsgirêka wergera Kurdan, ji çend hêlên cuda ve binirxînin û hin pêşniyaran di nava vê nivîsê de bikin. Lê belê, em ê berê behsa wergera ji kurdî bikin û monologa xwe bi vî awayî bidin destpêkirin. Em peyva « monolog » bi kar tînin, lewre li cem me nîqaş formeke monologê ye.

1- Wergera ji kurdî û danberheva zimanan

Di peywendiya zimanan de hêleke wergerê heye ku zû bi zû nayê bîra mirov û mirov her behsa wergerên ji zimanên din dike. Tim weha ye û gava ku em dibêjin werger, em behsa wergera ji kurdî nakin, lewre ew werger ji bo danasîna wêjeya kurdî ya li derve ye û bêtir bi rêya nivîskaran bi xwe ve tê kirin. Elbet di vê yekê de em behsa wergerên ji Cegerxwîn û Ahmedê Xanî nakin. Lewre Cegerxwîn bêtir ji bo fikrên çepgiriye û Ahmedê Xanî jî ji bo nasandina berhema wî *Mem û Zîn*ê hatine wergerandin ku nemaze jî ev mînaka dawîn serbilindiyeke wêjeya kurdî ye. Yên mîna *Şivanê Kurd*'a Erebe Şemo jî dikare dîsa weke ya Cegerxwîn bê nixandî û bi awayekî sembolîk hatine kirin. Ji xwe ew wergera ku ji bo turkî hatiye kirin jî, ji teksta romanê orjînal nehatiye kirin.¹

Li Almanya û Fransa û Swêdê, bi qasî ku tê zanîn, ev karê wergerandina berhemên wêjeya kurdî û berhemên nivîskarên dema me rasterast bi rêya nivîskaran bi xwe ve pêk tê. Heke nivîskar bi xwe tev li vî karî nebin jî, ew wergeran bi xwe peyda dikin, xelatan didin wan an jî peymaneke şexsî bi wan re datînin. Di vî karî de, mînaka wergerandina Mehmed Uzun'î navdar e ku wergerên wî yên hersê zimanan jî li ser daxwaza Mehmed Uzun'î bi xwe ve dest bi vî karî kiriye. Mirov dikare di vî warî de behsa hin nivîskarên din jî bike ku komputeran « laptop » diyarî hin kesan dikin an jî rasterast pereyan didin wan, da ku pirtûkên wan wergerînin zimanên ewropî (swêdî, yûnanî) an jî rojhilatî (turkî, erebî). Ma gelo wergera ku li ser vê bingehe pêk tê dikare encameke bi çi rengî bide? Hinkes dikarin bibêjin ku di zimanên din de jî weha ye û nivîskar bi xwe carinan wergeran peyda dikin. Ji xwe weha ye. Lê belê xelk berî hertiştî “wergêran” peyda dikin, ne rêya wergerê. Kesên ku dixwazin pirtûkên xwe bidin wergerandin, divê li ser vê yekê baş bifikirin.

Em dikarin mînaka pirtûkên ku werdigerin zimanên ewropî bidin. Me berê jî gellek çaran gotiye ku heke mirov pîrriya pirtûkên me wergerîne zimanekî din kesek dê nexwîne. Lewre, ziman û şewaza pirtûkeke kurdî di pexşanê de ji bo xwendevanekî ewropî dikare gellekî “naîf” be ku naîf peyveke weha ye ku, bi fransî, ji bo tiştên ku mirov naxwaze rasterast henekê xwe pê bike tê bikaranîn. Lewre, weke mînakeke ku me gellekî behs kiriye, bikaranîna hevokên kompleks li cem Fransiyayê ji bo ravekirina peywendiya tiştan e, digel ku di kurmanciyê de hevokên nivîskarên me yên herî dirêj dubarekirina peyvan û sînonîmên wan e. Lê belê, fransî ji şewaza ku di orjînal romanekê kurdî de hatiye bikaranîn fahm nakin û bi wan weha tê ku ew roman ji bo zarokan hatiye nivîsandî, lê xwe li qada mezinan radikişîne.

Ev pirsgirêk di berhemên kurdî yên wêjeyî de ji ber xwespartina zimanê devkî tê. Di zimanê devkî de, mirov gellek peyvên hevuate li pey hev rêz dike, da ku kesên hemberî mirov ji hevokê fahm bikin. Di zimanê nivîsê de, mirov nikare heman rêyê bicerribîne. Lewre

¹ Weke ku tê zanîn, Bazîl Nîkîtîn ev romana Erebe şemo ji rûsî wergerandibû fransî û Nûreddîn Zaza'yî jî heman roman ji fransiya wê wergerandibû kurdî û di sala 1947'an de li Beyrûdê dabû çapkirin. Lê belê li ser lêkolîneke ku me bi nîqaşekê di sala 2004'an de di rojnameya Peyama Kurd de dabû destpêkirin, birêz Nîzamettîn Elçî orjînal wê romanê ya bi kurmanciya Erebe şemo bi xwe peyda kir û gîhand me. Ew roman di pirtûkxaneyêke Erîvanê de hebû, lê kesekî guh nedabû orjînal wê û ew nedabû ber çapa wê ya heyî. Bi qasî ku em dizanin, Nîzamettîn Elçî li ser vê wersiyona kurdî ya yekem ku di sala 1935'an de ji aliyê Erebe şemo bi xwe hatiye çapkirin dixebitî. Me kopyayê wê pirtûkê ku Elçî ji me re şandibû daniye pirtûkxaneya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê. Ji bo agahiyê, pêwîst e ku mirov bibêje ku Erebe şemo bi alfabe ya latînî ew roman piştî çapa wê rûsî ji nû ve bi kurdî nivîsandîye û navê wê « şivanê kurmanca » daniye. Di alfabe ya wî de bi tenê tîpên dengdar ji ya Celadet Bedirxan cuda ne, lewre Erebe şemo ew heyşt tîp ji alfabe ya rûsî wergirtine.

di nivîsê de zimanekî weha ku bi dubarekirinê ve hatibe saz kirin weke zimanekî qels tê hesibandin. Ji ber wê jî, gava ku hûn şêwazeke bi vî rengî wergerînin zimanekî mîna fransî, xelk dikarin di bin simbêlan re bikenin. Lê belê ev tecrubeya wergera ji kurdî divê ji me re bibe jêderka hin têbiniyan ku yek jê ev e : di wergerê de asta zimanan divê tim di bîra wergerê de be. Ji ber wê ye ku di wergera wan ya fransî de carinan mirov dibîne ku hevokên nivîskarên kurd ji eslê xwe dirêjtir bûne. Bê guman, fransiyan dê ew hevokên kurt nexwandana û Kurd jî dê hevokên dirêj yên mîna romanên fransî zû bi zû nexwînin. Lê belê, mirov nikare bibêje ku kurdî dê nikaribe hevokên kompleks nas bike. Lewre, zimanê nivîskî ji xwe « dîtina » tiştan û bûyeran û peywendiya wan, di nava kompleksbûna van peywendiyên wan de û herweha di nava kompleksbûna vê « dîtîne » de rave dike. Bala xwe bidinê ku wergera turkî ya romanên kurdî bi hêsanî tê xwendin, lewre zimanê turkî yê nivîskî heman şêwaza vegotina devkî ku di nivîsandina me ya wêjeyî de serdest e baş nas dike. Ev jî ji ber wê tê ku bandora çanda dengbêjiya me û melodiya kurdî di zimanê turkî yê nivîskî de bi rêya nivîskarên kurdîzan baş hatiye bikaranîn ku nimûneyên wê yên herî naskirî Yaşar kemal û Ahmed Arif in.

Carinan hin ziman nikarin debarî hevdu bikin. Ji ber vê sedemê jî romana Marcel Proust'î di zimanê turkî de nikare têgihîştina Proust'î ya hevokan rasterast nîşan bide. Nimûneya wê ya herî balkêş hevoka destpêka *A l'ombre des jeunes filles en fleur* (çiçek açmış genç kızların golgesinde) e. Heke mirov bala xwe bide herdu wersiyonan, mirov dê bibîne ku hevoka wê romanê ya yekem di zimanê turkî de bûye pênc hevok, lewre zimanê turkî nikare debarî hevokeke ewqas dirêj bike.

Ji bilî cudabûna melodiya zimanan, herweha derfetên hevoksaziya zimanan jî dikare rêyê li ber sedeqata teksta orjînal bigire. Gîhanekên fransî û kurdî yên mîna « ku, digel ku, ji bo ku, da ku, berî ku, heta ku û hwd. », ku bi gellek fonksiyonan ve tînin bikaranîn dikarin hin bikaranînen zimanê nivîskî peyda bikin ku zimanê turkî wan nas nake. Ma ne bi rêya wergerê be, em ê çawa bikarin derfetên zimanekî bi rastî jî nas bikin ?

Lê belê ev naskirin, ne bi rêya wergera ji kurdî ve diyar dibe, bi tenê bi rêya wergera ji zimanên din ve dikare pêk were. Wergera berhemên kurdî bi tenê dikare ji bo reklama şexsan be û ji xwe weke ku me got bi rêya nivîskaran ve an jî bi rêya peywendiyên wan ve tê kirin. Ji ber wê ye ku li paş wergerên wan (carinan jî di pêşgotinên wan de) ji pesindayinan pê ve tiştekî din tune ye ku em gellek caran ji xwe dipirsin « ma gelo ev ew pirtûk e ku me bi kurdî xwendibû » ? Lewre, pirtûka ku di kurdiya wê de tiştek nebe, bi zimanekî din derdixin ezmanan ku mirov bi wan dikene, lê belê bandora van derewan pirr mezin e. Ji ber wê ye ku Yaşar Kemal gotibû ku Mehmed Uzun yekem romannivîsê kurd e û hê jî kesek nikare bawer bike bê çawa yekî ku pirtûkên kurdî nexwendibin bikare peyveke weha mezin bike. Ji ber ku berî Mehmed Uzun'î yazde (11) romannivîsên kurdî yên zaravayê kurmanciyê hebûn.

Ev nimûneyen ku me li jorê dan, eşkere dikin ku pexşana kurdî ji aliyê zimanê nivîskî ve hê nehatiye asta ku xwe bide ber zimanên ewropî. Pexşan li Ewropayê xwedî tecrubeyeke 700 salî ye, ya kurdî hê 150 sal (ji Mela Mehmûdê Beyazidî û bi vir ve) û ew jî bi qutbûyinên dirêj derbas kirine. Weke ku me berê jî gotibû, li welatekî mîna Fransayê, salê zêdetirî 500 romanên fransî û du qatê wê jî romanên wergerandî tînin çap kirin, li cem me ev hejmar di 70 salan de hê nuh bi giştî bi ser sedî ketiye û salê du sê roman tînin çap kirin. Pexşana me hê nû ye û jê re divê. Ev rexneya me ya li ser wergerandina berhemên kurdî jî ji ber wê ye.

2- Wergera ji zimanên din

Ya ku dikare bandora xwe rasterast û di cih de li ser wêjeya kurdî jî û zimanê kurdî yê nivîskî jî û herweha nivîskarên kurd jî bike, wergera ji zimanên biyanî ye û gava ku hin hevalên me behsa *pediviya wergerê* dikin jî, bêtir behsa vê wergerê dikin. Lewre ji bo

zimanên ku di rewşeke mîna ya zimanê me de ne, wergera ji zimanekî din ku di warê xwe de baş hatiye bikaranîn dikare bibe nimûneyeke baş.

Çima ?

Sedema wê herkes dizane, lewre gellek caran hatiye gotin. Em dikarin bi wergera biyanî ve zimanê xwe li hin celebên vegotinê bicerribînin ku di wêjeya me de nehatine bikaranîn. Me nimûneya wê ya hevokên kompleks a bi rêya gîhanekan ve li jorê da û ji zû ve ye ku gellek caran me bal kişandiye ser vê xala hevoksaziya kurdî. Ev kar dikare herweha bandorê li nivîskarê me jî bike. Weke ku tim tê gotin, (ji bo dubarekirinê bibihurin), “werger pireya çand û neteweyan e”, lê herweha pireya zimanan e jî. Ji ber ku wergerên baş hindik in, îroj heke hûn bala xwe didin edebiyata kurmanciyê, hûn ê li zimanekî pirr qels rast werin. Lewre, nivîskarên me hê bi derfetên zimanê xwe nehisiyane û nizanin ku zimanê nivîskî ji yê devkî dewlemendtir e.

Weke nivîskar, ya ku bêtir divê bala mirov bikişîne, bandora wêjeya biyanî ya li ser wêjeya me ye. Belkî mirov dikare wan berhemên bi zimanên wan yê orjînal jî bixwîne, lê belê, ji xwe nivîskarên kurd pirraniya pirtûkan ji zimanê orjînal an jî bi rêya zimanên mîna turkî, erebî û farisî ve dixwînin (li Ewropayê bin jî, dîsa piraniya wan bi van zimanan dixwînin), lê dîsa jî bandora vê yekê li wan nabe. Hingê, heta ku ew pirtûk yekser bi kurdî neyêne çapkirin, (û herweha neyêne xwendin) zehmet e ku mirov hêviya bandoreke wan di wêjeya kurdî de bike. (Zehmet e ku mirov bawer bike ku *Navê Min Sor e* ya Orhan Pamûk'î bi kurdî ji aliyê bakuriyan ve hatibe xwendin). Weke ku me got, werger pireya zimanan e jî û derfetê dide ku ziman xwe li hevdu bicerribînin.

Di nava wergerên kurdî de, di vî warî de mixabin hê asteke wergerê ya baş di kurmanciyê de nehatiye bidestxistin ku werger bikare vê fonksiyona xwe pêk bîne. Girîngtirîn wergera ku bi kurmancî hatiye çapkirin, bê şik, divê weha be ku him zimanê wê wergerê û him jî şewaza nivîskarê wê di kurmanciyê de were parastin. Sadiqiya li hember teksta orjînal jî ji xwe ev e. Heke mirov bala xwe hinekî bide wergerên kurmanciyê, mirov dê bibîne ku kêr berhem hene ku mirov bikare wan weke wergerên biserketî bi nav bike.

Gava ku mirov dibêje ku wergerên me nebaş in, xelk dikarin bibêjin qey ji binî ve wergerên baş nînin. Ji bo ku neheqî li kesî neyê kirin û nimûneyên baş werin dayin, mirov divê navê wergerên Mustafa Aydogan'î û Hesenê Metê'yî û Ehmed Huseynî'yî di vira de hil bide ku karê wan şayanî pesnê ye. Di xwendina hersêyan de jî mirov zû bi zû li wergerê nalikume, lewre wergereke nebaş, xwe zû eşkere dike û ev yek dikare rêyê li ber xwendinê jî bigire. Nemaze di warê parastina şewaza nivîskêr de jî ew vê pesnê heq dikan.

Di helbestê de, digel ku weke pirtûk çap nebûbe jî, me hê wergereke weke helbesta Aragon'î ya navdar *Evîna Bextewar Tune ye* ku ji aliyê Cemîl Denlî ve hatibû kirin û di kovara *Jiyana Rewşen*'ê de hatibû çapkirin nedîtiye. Wergera Rênas Jiyân'î ya *Bajar*'a Kawafîs jî di heman astê de ye. Wekî din, gellek kesan xwe lê ceribandîye, lê hema wergera Ahmed Arif'î ku êdî bûye qada cerribandinê dikare asta wergera helbestê di kurdî de baş nîşan bide. Edî diyar e, helbest nayê wergerandin, tê adaptekirin. Ji bo vê jî giringiya van herdu helbestên ku me navên wan dan dikare baştir were fahmkirin.

Heke mirov hema bi kêmanî bala xwe bide navê van kesên ku wergerandine û me behsa wan kir, mirov dê bibîne ku ev kes di berhemên xwe bi xwe de jî zimanekî xurt bi kar tînin. Hingê, encam li holê ye : ji bo ku mirov bikare xwe li wergerê rakişîne, divê mirov bi ruhê vî zimanî baş bizane. Ne weha ku hema hevlekî mirov hebe û bi farisî bizane û mirov jê bixwaze ku ji farisî tiştan ji bo me wergerîne. Ev kar bi çeqoberî nayê kirin û mirov ji xwe ber nabe werger û karên weha jî bi kêrî me û zimanê me nayên.

Taybetmendiyên wergereke bi vî rengî ku bi kêrî me were çî ne ? Ji bo bersivandina vê pirsê divê mirov çend pirsan bike û bes e.

- **Hilbijartina berhemê li gora kîjan pîvanan pêk tê ?** Heke hûn rabin, weke ku hin hevalên me dikin, nivîskarên ku kes nas nake wergerînin, hûn ê fêdeyê mezin

li kurmanciyê nekin, lê hûn ê bi tenê peywendiyên xwe û wî nivîskarî xurt bikin ku belkî ew bi kêrî şexsê we ve bê. Heke na, tu sedema din tune ye ku mirov nivîskarekî nenas wergerîne kurmanciyê. Lewre, di rewşeke weha de ku kurmancî nayê xwendin, armanca sereke divê ew be ku em *zimanê xwe bi milletê xwe bidin hezkirin*. Ew jî bi wergerandina nivîskarên xurt û navdar ve pêk tê. Wergerandina nivîskarekî turk ku hê li Stenbolê kesek wî nas nake, ji bo me, di vê demê de, lukseke mezin e, lê mixabin li Diyarbekirê em wî nivîskarî navdar dikin.

- **Taybetmendiya wergerê bi xwe çi ne?** Gelo herkes dikare wergerîne? Divê mirov ji bîr neke ku her kesê ku dizane bi kurdî binivîsîne, nikare xwe li wergerê bicerribîne, lewre werger bi rastî jî hunerek e û divê wergerê bi wergerê û herdu zimanan jî baş bizane, nivîskêr bi berhem û zimanê wî yê nivîsê (şewaz) baş nas bike û hingê rabe û wergerîne. Ji bo wergereke bi vî rengî jî, divê mirov herweha zimanê orjînal jî baş nas bike. Heke hûn bi turkî baş nizanibin, hûn nikarin berhemên turkî wergerînin û xwendina zanîngehan jî ji bo Kurdekî ne bes e ku bibêje qey bi turkî têra wergerê dizane.

- **Pêvajoya wergerê û finansmana wê ya ji aliyê dezgeh û weşanxaneyan ve çawa pêk tê?** Bi qasî ku em dibînin, di nava Kurdistanê de, wergerê bi xwe berhemê hildibijêre û kesekî din jî alî wî nake ku ev yek dikare li hember berhemê bibe xeteriyê mezin. Lewre werger ji bo zimanekî mina zimanê me ne karê şexsan e û divê şexsî jî nemîne. Piştî ku hate wergerandin, divê ji aliyê hin kesên din ve jî were xwendin û hê nû tamam bibe. Hingê xema me ya yekem divê ew be û heke em bixwazin bigihîjin armanca xwe jî, divê em bi zanebûnê tev bigerrin. Ev zanebûnê jî wergerandina bi kesên şareza ye û divê rê li ber wergerên xerab were girtin.

- Pirsê dawîn jî ew e bê **em ji kîjan zimanê werdigerînin**. Heke mirov li hejmara wergeran binihêre, mirov dê bibîne ku nivîskarên welêt ji turkî û yên li Ewropayê jî ji zimanê din werdigerînin (lê ji zimanê din be jî, dîsa jî ji turkiya wê werdigerînin). Dibe ku bi zimanên ewropî baş bizanin jî, em lê diniherin ku di wergera wan de pirsgirêk heye, lewre kurmanciya wan bi pirsgirêk e ku em ê çend mînak li jêrê bidin. Herweha carinan berhemên wêjeya cîhanî jî ji turkî tene wergerandin, lê li ser berhemên nayên nivîsandin. Weke mînak, hin berhemên ku ji fransî û inglîzî û zimanê din hatine wergerandin, ji aliyê kesên ku bi van zimanan nizanin ve hatine kirin. Ma qey kesekî ku bi van zimanan zanîbû tunebû?

2.1- Wergerên ji turkî

Piştî van pirsên bingehîn, hingê mirov dikare fahm bike bê ji bo çi wergera herî zêde ji turkî tê kirin û ji bo çi tu bandora wê çênabe. Nivîskarên kurd jî xwe wêjeya turkî dixwînin û bandora wê, heke hebe, yekser pêk tê. Çi erênî û çi jî neyînî, gava ku mirov dixwîne, mirov baş dizane bê kîjan nivîskarekî kurd wêjeya kîjan zimanê dixwîne, hetta carinan mirov di cih de pê derdixe bê ew ji kîjan nivîskaran hez jî dike, lewre şopa xwendinê di berhemên mirov de nikare were veşartin. Heta ku ne berhemeke sembolîk be, mirov divê ji turkî wernegerîne. Heke werger rabe û ji me re bibêje ku ew hesabê Kurdên başûr dike, hingê em ê jê bipirsin ma gelo xwendina berhemên ewropî an yên turkî ji bo Başûriyan baştir e. Pirsê din jî ew e: ma gelo Başûrî bi tîpên latînî dixwînin? Divê em ji hevdu re rastiyê bibêjin. Li Başûr kurmanciya bi tîpên latînî nayê xwendin. Bazara wêjeya kurmancî ya mezin li Bakur e. Ji ber wê jî, *Sîsirkê Hesînî* ya Selîm Berakat (wergera Ehmed Huseynî) ji gellek berhemên din bêtir bi kêr hat, lewre Kurdên bakurî bi erebî nizanin.

Hingê divê em ji turkî bêtir ji zimanên din wergeran bikin, lê belê heke hûn Balzac wergerînin, ew ê bi kurdî heta ku dibistanên kurdî venebin neyê xwendin, lewre bazara wan tune ye û bazara berhemên bi vî rengî jî dibistan in. Hûn îroj Kafka jî wergerînin, James Joyce jî wergerînin kesek naxwîne. Lewre, yê ku dikare van nivîskaran bixwîne ji xwe ew jî berê de bi zimanine din xwendine.

Berhemên ku em ê bixwînin, ew berhem in ku ji aliyê nivîskarên dema me yê navdar hatine nivîsandin. Mesela, romana Milan Kundera ya dawîn dikare bibe mînak. Heke romaneke Milan Kundera an jî Michael Cunnigham an jî Paul Auster an jî Philippe Roth bi kurdî bê çapkirin, divê pirtûkeke weha be ku reqabeta wê ya turkî nebe an jî hê nebûbe². Ji ber wê, divê berî hertiştî peywendî bi wan nivîskaran re were danîn. Lê belê, yê me ji bo ku belaş bi dest bixin, berê xwe didin nivîskaran klasîk ku xelkê berê bi turkî xwendine. Pêşniyara me dikare ew be ku wergêr û weşangerên me pirtûkên ku bi turkî nehatine çapkirin peyda bikin an jî nivîskarên ku bi zimanê turkî nehatine çapkirin keşif bikin. Hejmara wan ne hindik e; bi tenê, pêwîst e ku mirov lê bigerre. Ma Juan Rulfo'yê xwediyê romana *Pedro Paramo* kengî bi turkî hate çapkirin? Digel ku pêncî sal di ser nivîsandina wê re derbas bûye, Ewropî bi xwe jî hê nû pê hisiyane û demek berê bi turkî hate çapkirin. Herweha romana Michael Cunnigham ya bi nave *Xaniyê li dawîya dunyayê* jî bîst û pênc sal bi şûn de bi turkî hate çapkirin, lê heta ku Cunnigham'î xelata Pulitzer bi romana *The Hours (Saet)* ve nestend jî kesî ew nas nedikir. Hê gelo çend pirtûkên wî hene ku nehatine wergerandin? Ev e pirsra ku weşangerê baş divê ji xwe bike. Heke îroj mirov wergerîne, divê mirov nivîskarên mina Michael Cunnigham (amerîkî) û Pierre Charras (îspanyol e, lê bi fransî dinivîsîne) û Olivier Adam (fransî) wergerîne ku hê nû tînanaskirin û dê baş bêne xwendin. Herkes dizane ku romanên baş bi inglîzî, fransî û îspanyolî tînan nivîsandin. Divê mirov li wira li nivîskaran bigerre.

2.2- Bandor û pêdiviya wergerê

Li gora van fikrên ku me li jorê gotin, têgihiştina me divê ji wergerê li ser du xalan were saz kirin ku li kêleka wan dikare gellek xalên din jî hebin, lê yê girîng ew in:

- 1- Divê ew werger bi kêrî zimanê kurdî û derfetên wî were.
- 2- Divê bandora wî nivîskarî li ser berhemên wêjeya kurdî were hesibandin.

Heke mirov van herdu xalan di nivîskarekî biyanî de hevî neke, hingê divê mirov wernegerîne. Me mînaka Balzac'î da, divê ev mînak xelet neyê nirxandin, lewre me dikarî mînaka Stendhal'î jî bidaya. Wergera Stendhal'î û Balzac'î ne karên me yê pêşîn in, lê karên me yê belaş in. Ji ber wê, ew dikarin bêne fahmkirin.

Di wergera wêjeyî de divê mirov ji bîr neke ku ji xwe herkes dizane ku ew werger e, lewre li ser berga pirtûkê navê nivîskêr hatiye nivîsandin. Lê belê gava ku di xwendina wê de hat fahmkirin ku werger e, hingê hûn dest têxin qirika xwendevên jî, ew ê nexwîne. Lê gelo, heke em berga wê biçirînin, nave lehengan û bajaran û referansên din bikin kurdî, gelo dê dîsa jî bê fahmkirin ku werger e? Pirsra bingeîn ev e.

Herkes dizane ku Victor Hugo û Albert Camus û Kafka'yî bi kurdî nizanîbû. Lê yê ku van nivîskaran baş nas dike, dikare lê bifikire ka gelo heke Camus û Kafka'yî bi kurdî binivîsandaya dê çawa binivîsandaya. Weke mînak, em dizanin ku heke Marcel Proust kurd bûya û bi qasî Mehmed Uzun'î bi kurdî bizaniya, wî dê qet û qet mîna Mehmed

² Hin hevalên me dikarin bibêjin qey tiştêkî weha ne mimkun e, lê belê em bi bîra wan ve tînin ku romana Milan Kundera ya bi navê « L'ignorance » (Bilmemek- Nezanîn), berî fransiya wê, bi turkî hate çapkirin, digel ku ew roman bi fransî hatibû nivîsandin.

Uzun'î nenivîsandaya. Lewre têgihîştineke wî ya zimên ya cuda heye ku me berê behsa wê kiribû. Pirsra bingeşîn ku em dixwazin di vê nivîsê de bikin jî ji xwe ev e û qada nîqşa me firehtir dike û ber bi wêjeya kurdî ya pexşanî ve dibe. Em nizanin zimanê xwe di pexşanê de bi qasî ku di eslê wî de heye xurt bi kar binin û tecrubeya me ya pexşanê hê tune, an jî hê têr nekemiliye.

Di wergeran de hin feq hene ku heke mirov lê rast were, mirov di cih de nas dike. Em ji wan re dibêjin “tiştên ku nayên wergerandin” û ew jî biwêj û hin qalibên peyvên in ku bi çanda zimanekî ve têkildar in. Hûn dev ji wergeran berdin, heke mirov bergên hin pirtûkên kurdî yê nivîskarên kurd biçirîne jî mirov dikare bikeve wê baweriyê ku ew jî werger e. Belê, divê em ruhê kurmanciyê bidin wergerê. Mixabin, di wergerên kurmançî de mirov kêman caran vê taybetmendiyê dibîne û ji ber wê jî em dibînin ku “bin çengên lehengan dinexin”. Yanî *qoltuxên wan qabarmîş dibin* ku wergerên me nizanin “serî li wan mezin bikin”.

Ev nimûne (çavkanî ne giring e), baştirîn nimûneya qelsiya wergerên me ye. Mirov dikare çend nimûneyan bide ku ev rexneya me baştir were fahmkirin. Armanç di van nimûneyan de ne rexnekirina şexsan û berhemana e, lê belê rexnekirina têgihîştineke wergerê ye. Bikaranîna bi vî rengî û mayîna di bin desthilatdariya fikra zimanekî din de dikare di berhemên nivîskarên zimanê kurdî de jî xwe bide der.

“binçengê wî nepixî”: (*Koltuklari kabardi*) ev ji romaneke bi turkî ye û di wergera kurdî de hebû, lê belê diviya bibûya “*serî lê mezin bû*”.

“ne dîlan e, ne seyran e, zavayê min çima ramûsan li rûyê min de?” : ev nimûne ji romaneke kurdî hatiye wergirtin. Turkiya wê herkes dizane. (*bayram degil, seyran degil, eniştem beni niye öptü?*).

“ji zimên re hêsan e, yazde sal bi hev re borandin”: ev jî ji heman romanê hatiye wergirtin. Lê belê eslê wê hevokê bi turkî ye (*dilê kolay, on bir yıl birlikte yaşadılar*).

“li ber deriyê otelê hilma xwe veda”: ev nimûne ji romaneke kurdî ya din hatiye wergirtin ku dîsa bi turkî hatiye fikirîn (*otelin kapisında aldi solugu*).

“ji xwe gava X ji xeynî me tu fayde ji derdorê nebîne, ku dê nebîne, lewre ...”: (*me navê lehengan bi zanebûnî nenivîsand*) ev nimûne jî ji romaneke kurdî ya dîtir hatiye wergirtin ku bi turkî hatiye fikirîn, lewre “ku dê nebîne”, dibe “ki görmeyecek de” û di turkî de formeke navdar e.

“Almanya: welatek e, li ku Tirk mafên Kurdan dipejirînin”: ev hevok ji nivîseke qerfî ya li ser malpereke kurdî hatiye wergerandin. Di zimanên mina fransî (*où*), inglîzî (*where*) û rûsî de ev gîhaneka ku em dibînin (*li ku*) ji bo girêdana hevokên pêreyî yê rengdêr tê bikaranîn. Ji xwe nivîskarê wê hevokê bi van hersê zimanan jî dizane, lê belê bi kurdî hevokeke weha nayê saz kirin lewre “li ku” bi tenê di pirsan de tê bikaranîn.

“Kakeyî: Dîne Kurdan, di nav kîjanî de ji jinan re dibêjin ‘kekê’...”: Ev nimûne ji heman nivîsa qerfî hatiye wergirtin. Dîsa pirsgerêka gîhanekê (kîjan) ye ku ev gîhanek bi wergera xwe ve di fransî de, di inglîzî de û di rûsî de dîsa ji bo diyarkirina hin taybetmendiyên navê berî xwe tê bikaranîn. Di kurmanciyê de ev gîhanek bi tenê ji bo pirsan tê bikaranîn.

“Pêştirî wê yekê X basa Iraqê jî kir, di nav sînorên kîjanî de beşa Kurdistana wê ye”: Ev jî ji wergereke heman nivîskarî hatiye wergirtin ku diyar dike ku pirsgerêk ne ya wergerê ye, lê ya qelemê ye. Lewre tê de dîsa “kîjan” heye ku zimanê kurdî wê forma “kîjan”ê nas nake. Kurdên Kafkasyayê jî ji ber bandora zimanên (rûsî) ku dizanin, di nivîsên xwe de tim heman forman dubare dikin û ^dî ketiye nava kurmanciya wan jî. Lê weke ku diyar dibe, ev hevok sed salî bimîne jî ji aliyê Kurdên din ve nikare were fahmkirin.

“Ger hişyar bû, agahiyê bidin min”: Ev jî ji romaneke kurdî ya din hatiye wergirtin ku turkiya wê dibe “eger uyanirsa, haber verin bana”. Bala xwe bidinê ku peyv bi peyv dibe wergera turkî. Di kurmanciya bakurî de êdî hin qalibên zimên ava bûne ku bi bandora zimanê turkî ketine zimanê me. Heta ku ji mirov tê, divê mirov xwe dûrî van celeb hevokan bike. Di kurmanciyê de ev hevoka jorê dê bibe “*heke bi xwe hisiya, hayê min jê çêbikin*”, an jî “*gava ku hat ser hişê xwe, hayê min jê çêbikin*”, lewre di romanê de kesê ku behsa wî dibe ne li ser hişê xwe ye. Peyva şiyarbûyinê, bêtir ji bo kesên ku di xew de ne tê bikaranîn. Di kurdî de “mirov agahiyê nade kesî”, lê belê, “mirov hayê hevdu jê çêdike”.

Di mînakên de, me behsa bandora hevoksaziyê nekir, lewre ev mînak dê nivîsê dirêjtir bikin. Lê hema mînakeke bi tenê dikare nîşan bide bê em behsa çî dikin.

Ev a ku min berî çend rojan li bajêr dîtibû ye: ev mînak ji diyalogekeke romaneke kurdî hatiye wergirtin. Cîhê lêkera “bûyin”ê ji bo kesên ku bi turkî nizanin dikare bibe cîhê pirsan jî. Lewre, di kurmanciyê de lêkera bûyinê tucarî bi vî awayî nayê piştî lêkerekê din. Mirov baş dizane ku ev hevok dibe “bu benim birkaç gün önce şehirde gördüğüm kizdir”. Di turkî de hevokên pêreyî (yardimci cumle) bi lêkerên nîvmastarî ve tînen sazîkirin ku em ji wan re dibêjin “fiilimsî”. Di kurmancî de “fiilimsî” tunene û lêker weke zimanên hindoeuropî li gora kes û deman tîne tewandin (an jî kişandin). Ji ber wê jî, kurmancî bi tenê di hevokên kurt de dikarî debarî vê formê bike an jî heman fikrê bi awayekî kurdîtir rave dike û dibêje “ev keçik ew keçik e ku min çend roj berê li bajêr dîtibû”

Ev filmê gelek bandorker e ji ber ku ne tenê bêrehmiya şer, di heman demê de li ser diyariya ku di şeran de em di nava dilê xwe de dibînin e: Pirsgirêka ku me ji bo mînaka jorê destnîşan kir, di vê mînakê de dikare zelatir were dîtin. Me ev mînak jî ji malperê kurdî wergirt. Di vê hevokê de tîra xwe eşkere ye ku fakir ne bi kurmancî ye û sedem jî dîsa cîhê lêkera bûyinê ye ku di vîra de di dawiya hevokê de ye.

Gava ku mirov bala xwe dide van mînakên, mirov bi hêsanî dibîne ku di nivîsandina nivîskarên me bi xwe de pirsgirêk heye. Me navên wan nedan, lê me teva yên jorê nimûneya pênc romanên kurdî, sê nivîsên kurdî û du wergerên kurdî da, lê pirsgirêk qet nehat guhertin. Zimanekî şikestî bi nezanî hatiye avakirin û di rojname, kovar, internet û televîzyonên kurdî de ev kurmancî tê bikaranîn. (Me berê behsa stranan kiribû). Ji ber wê ye ku em nema dijîn, lê em “jiyan dikin”, ji ber wê ye ku “kevîrê sebra me dişikê” (sabit taştî çatlak), “lehiya mirovan radibe” (insan seli), “di şerr de gellek wendayî tînen dayin” (kayıp vermek) û em ji “pêvajoyê re dibin bersiv” (süreçe cevap olmak), lê xelk ji me fahm nakin. Lewre, gava ku em vî pirsê ji pêşkêşvanên televîzyonên kurdî dikin, ji me re dibêjin “tekst bi turkî tînen nivîsandin û bi dû re tînen wergerandin”. Ji ber wê ye ku xelk ji dêleva nûçeyên kurdî, xwe didin benda “haberlerên” turkî.

Heke mirov mînakên pirtûkan û yên televîzyon û rojnameyan bide ser hev, dê pirsgirêkeke xurt jê derkeve ku dibe mijara tezeke doktorayê: zimanê me ji eslê xwe bi dûr dikeve û zimanekî şikestî ava dibe.

2.3- Çareserîya vî pirsgirêkê çî ye?

Bersiv hêsan e, ji ber wê jî ev beş dê kurt be. Mirov yekî ku baş bi turkî dizane û baş bi kurdî jî dizane weke şêwirmend datîne ser karan û ew kes hemû tekstên ku dê bêne xwendin sererast bike. Deh sal berê me heman rexne li wan hevalên xwe yên rojnameger û karmendên televizyonan digirtin. Hêvî ew e ku di van deh salên pêş de ew hevalên me piçekî guh bidin rexneyan û me ji monologên nivîskî xelas bikin. Pirsgirêka bingeîn jî werger e. Ji bo wergerê be jî, ji bo weşandinê be jî, ji bo televizyonê be jî, divê yek kes an jî lijneyeke şêwirmendan hebe ku zimanê pirtûkê, wergerê an jî televizyonê sererast bike. Em behsa fransî nakin, em behsa erebî jî nakin û îspanyolî jî nakin. Em behsa zimanê kurdî dikin. Destê xwe deynîn ser wujdanê xwe. Dibistanên me nînin. Dezgehên me yên zimanî nînin ku li zimên miqate bin û ji bo sererastkirina wî bixebitin. Em weke millet ji holê radibin. Pirtûkên me beradayî ne, em nizanin zimanekî nivîsê yê xurt bi kar bînin. Stranên me dejenere bûne. Kurdên spî derketine û em reş kirine. Ma milletekî din ku di vê rewşê de ye li ser rûyê vê dunyayê maye? Hingê divê em ji zimanên din zîrektir û organîzetir bin û bi tena serê xwe tev negerin. Yanî divê em hebekî xema vî zimanî bixwin.

Di vî beşê nivîsa xwe de, pêwîst e ku mirov balê bikişîne ser xaleke din jî ku bi wergerê ve têkildar e. Di destpêka Komara Turkiyeyê de, Hasan Alî Yucel'ê wezîrê perwerdehiyê wergêr digirtin û berhemên fransî û almanî û inglîzî bi wan didan wergerandin. Bi qasî ku ji pêşgotina ku wî bi xwe nivîsandiye tê fahmkirin, ew dixwaze wêjeyê bîne zimanê turkî û zimanê turkî jî xurttir bike.

Em dibînin ku îroj hin weşangerên me yên kurd jî berhemên edebî ji zimanên biyanî werdigerînin zimanê turkî ku mirov bivê nevē vê pirsê ji xwe dike: gelo ew xizmeta çî dikin? Ji ber ku werger xizmeta zimanekî dike û pireyan di navbera wî û zimanên din de datîne. Kurdek divê berî hertiştî xema zimanê xwe bixwe...

3. Taybetmendiyan wergereke baş çî ne?

Berî hertiştî, divê mirov bizane bê mirov çî werdigerîne. Gelo em behsa wergera wêjeyî dikin an behsa wergera zanistî dikin? Ev herdu werger bê guman ne yek in. Di wergera zanistî de mesaj giring e, lê belê di wergera wêjeyî de ji bilî mesaj û wateyê, hevok, şewaz û kontekst giring e.

- 1- Werger divê berî hertiştî wî nivîskarî bi zimanê orjînal baş bixwîne, lêkolînên li ser wî peyda bike û li ser nivîskariya wî û zimanê wî bixebite. Beyî vê lêkolîna li ser nivîskar û berhemê, ew werger zêr be jî dê ne biserketî be û tu feydeyê negihîne zimanekî.
- 2- Divê mirov zimanê orjînal baş nas kiribe. Biwêjên wî, argoya wî, helbestiya wî û melodiya wî xitî kiribe. Hevoksaziya wî, gramera wî, listikên peyvan û cudahiya şewazan bizane. Yanî divê mirov bi wî zimanî baş bizane, da ku ji hevokan xelet fahm neke.
- 3- Ji aliyê tevî, şewaz, estetîka tekst û zimanê berhemê û nivîskariyê ve sadiqî berhema orjînal be. Têgihîştina ku nivîskar di warê zimanê xwe û şewaza xwe û herweha çîroka xwe de di berhema orjînal de dide û bi cîh dike, divê di wergera wê de jî baş diyar bibe û were parastin. Ev xal jî lêkolîna ku di xala yekem de tê gotin giringtir dike.
- 4- Divê di wergera wê de xeletiyên rastnivîsandinê nebin û baş hatibe sererastkirin. Ji xwe werger e, tew îcar xeletiyên wê jî hebin, mirov dê qet nexwaze bixwîne.
- 5- Divê werger bi zimanê ku lê tê wergerandin jî pirr baş zanibe. Yekî ku bi xwîna kurmanciyê nizanibe, pê nemiribe û ava wê venexwaribe, nikare wergeran ji bo wê

bike. Ne bi tenê bi xwendina kurmanciyê, lê divê ew bi kurmanciya folklorîk jî baş bizane, ya malê jî û ya sûkê jî û ya hikumetê jî. Lê ya herî giring, divê ew bikare zimanan ji hev nas bike û guh bide hevoksazî û melodiya kurmanciyê.

- 6- Divê mirov fahm neke ku werger e. Heke ne weha be, mirov dê nexwaze bixwîne û berê xwe bide turkiya wê. Ji ber wê jî, carinan divê werger bizane “kirasê kurdî li berhemê bike” û ev jî bi hemû xalên jorê ve têkildar e.

4- Encam

Ev taybetmendiyên wergera baş, kêr zêde ji aliyê herkesî ve tên zanîn û lêkolînerên wergerê berê jî behsa wan kiriye. Kesê ku dil hebe û berê xwe bide wergerandina berhemekê an jî nivîsekê, ji xwe berê van pirsan ji xwe dike. Lê belê, ya giring ew e bê ka wan heta kîjan redeste bi cîh tine û di kîjan merhaleyê de wan ji bîr dike. Heke îroj hûn ji wergêrekî kurd bipirsin, ew ê rexneyê li hemû wergêrên din bigire. Lê belê, ew ê tucarî nebêje ku kêmaniyên wî bi xwe jî hene. Ji xwe rexnekirina wêjeyî li cem me sedema kuştinê ye. Ji ber wê jî, me çavkaniyên mînakên vê nivîsê nedan. Lê em hêvî dikin ku “hin werger ji vê pêvajoyê re bibin bersiv”.

Êdî qedera zimanê me di destê weşanger, nivîskar, stranbêj, pêşkêşvan, rojnameger û wergêran de ye.

Weke ku Xanî di destpêka *Mem û Zîn*'a xwe de digot:

“Da xelq-i nebêjtin ku : Ekrad
Bê marîfet in, bê esl û binyad”

« şûrê hunera me bête danîn
Qedrê qelema me bête zanîn »

« lê hêvî dikim ji misteîdan
herfan negirin li misteîdan »

« ev name eger xirab e, ger qenc
kêşaye digel wê me dused renc »

« çî'bkim ku qewî kesad e bazar
Nînin ji qumaşê re xerîdar »

Hin çavkaniyên sereke ji bo vê mijarê

AYDOGAN Mustafa (2001).- « Werger hunerek e » pp. 165-205 in *Berê gotin hebû*.- Istanbul: Doz.

DEMMANUELLI Jean & Claude (1990).- *La traduction mode d'emploi*.- Paris : Masson.

ECO Umberto (2006).- *Dire presque la même chose : expérience de traduction*.- Paris : Grasset.

FLAMAND Jacques (1984).- “Qu'est-ce qu'une bonne traduction?” in *Meta*, vol. 29, n° 23, pp. 330-334.

MOUNIN Georges (1963).- *Les problèmes théoriques de la traduction*.- Paris : Gallimard.

RICOEUR Paul (2004).- *Sur la traduction*.- Paris : Bayard.